Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :985 | 7-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


# Pişemasiyekî kêmdîtî

**Di binê avê de gelek cure masî û heywanên din hene ku em derbarê wan de kêm tiştan dizanin.**

Di binê avê de gelek cure masî û heywanên din hene ku em derbarê wan de kêm tiştan dizanin. Ev pişemasiyê ku bi ber çavê kamerayê ketiye jî cûreyekî kemdîtî ye. Bi reng û xweşikiya xwe derdikeve pêş.

Kameraman ew li Papua Gîneya Nû girtiye. Dema ev pişemasî di ber wî re derbas bûye, ew girtiye kamerayê û dîmenên wê yên xweşik nîşanî xelkê dide. Nexasim xêzên li ser pişta wê pirr xweşik in. Navê van pişemasiyan “Chirodectes maculatus” e û ev bû cara diduyan ku dîmenên wan tên qeydkirin.

Cara yekê, sala 1997’an, zanyarên Awustralyayî dîmenên wan girtibûn. Di sala 2006’an de jî ev nav lê hatibû kirin. Zanyar dibêjin, li gel ku ew bi gewdeya xwe mezin in jî, kêm caran tên dîtin û zû bi zû bi ber çavên kamerayan nakevin..

***Ozgûr Polîtîka***



## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bertek | Derketina li hemberê tiştekî, nerazîbûn: Li hemberî kiryarên wî bertek nîşan da. |
| Şênî | Yên li ciyekî ava dijîn: Şêniyên gund cejin pîroz dikirin. |
| Şênber | Tiştên ku mirov dikare destê xwe bide wan û bibîne. Melmûs: Weke kevir, av, dar… |
| Razber | Tiştên nayên girtin û dîtin. Tersê şênber: Weke heskirin, xemgînî… |
| Bîrdozî | Koma fikrên ku di warê siyasî, hiqûqî, zanistî, felsefî û dînî de rê didin ber tevgerên komekê, partiyekê yan rêveberiyekê. Îdeolojî. |
| Guncaw | Tişta bi kêr tê. Mûnasib: |
| Pêman/pêwan | Wesîle: Bi pêmana salvegerê şahiyek hat lidarxistin. |
| Hişmendî | Têgihiştin, zêhniyet: Hişmendiya wî ya derbarê jinan de ne rast e. |
| Vegirtin | Standina erdekî, milkekî bi darê zorê ji kesekî. Dagîrkirin: Welatê me vegirtin. Wateyên wê yên din jî hene. |
| Bişaftin | Helîna hêdî hêdî: Kevaniyê keşk bişaftin û dewê wan berda ser xwarinê. Herwiha bi mecazî tê wateya asîmîlebûnê jî: Civaka ne azad be tê bişaftin. |

# Şaneyên mirî zindî kirin

**Zanyaran bi sîstemeke jê re OrganEx tê gotin, fonksiyonên şaneyan yên di laşê berazên mirî de zindî kirin.**




Zanyaran bi sîstemeke jê re OrganEx tê gotin, fonksiyonên şaneyan ên di laşê berazên mirî de zindî kirin.

Berazên ku saetek di ser mirina wan re derbas bûbû, hîna jî şaneyên dil, mejî û kezeba wan sax bûn.

Yanî bi xêra sîstema OrganEx zanyar êdî wê karibin piştî mirinê jî organ û endamên berazan zindî bihêlin. Yanî beraz bimire jî organên wî wê sax bin. Ev jî bi rêya girêdana heywên bi sîstemeke pompe û fîltreyan û avên di vê sîstemê de digerin mumkin dibe. Armanc ew e ku şaneyên organên heyatî yên heywanê mirî, sax bin.

Siberojê ev sîstem dikare bê bikaranîn ji bo ku organên bexşandî, piştî mirina kesekî jî zindî bin, heta ku wan bi kesekî din ve bikin. Ev yek wê hejmara organên ji bo nexweşên hewce zêde bike. Ev sîstem li Yale School of Medicine hatiye bipêşxistin û bi gotareke zanistî encamên ceribandina sîstemê li ser berazan hatine eşkerekirin.

***Ozgûr Polîtîka***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | Q | E | R | ■ | B | Î | R | A |
| 2 | K | E | W | ■ | L | A | L | ■ | L |
| 3 | ■ | L | ■ | J | Î | ■ | A | R | Î |
| 4 | K | E | R | ■ | M | A | W | E | ■ |
| 5 | A | M | E | T | A | ■ | E | ■ | N |
| 6 | L | ■ | Ş | Û | ■ | A | ■ | A | A |
| 7 | O | F | ■ | L | A | P | A | Z | ■ |
| 8 | ■ | E | C | E | L | ■ | S | A | F |
| 9 | I | R | A | ■ | A | M | A | D | E |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 2 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 3 | | | | | ■ | | | | |
| 4 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 5 | | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 6 | ■ | | ■ | | | ■ | | | |
| 7 | | | | | | | | | ■ |
| 8 | | | | ■ | | ■ | | ■ | |
| 9 | | ■ | | | ■ | | | | |

### ÇEP-RAST

1. Nexweşiyek… Notayek… Beyreq, sembola welatan
2. Tevgera hewayê… Di nav sewalên bejê de yên herî mezin
3. Benderihên li çolan dijîn… Di dereke robar de di saniyeyê de hecma herikîna avê
4. Nexweşiyek… Peyva neyînî… Alava pê hespan tîmar dikin
5. Nasnavê rêberê olî yên elewiyan û derwêşên terîqeta mewlewiyan… Kurteya piştî zayînê
6. Notayek… Kesê ji gelê Polonya
7. Zimanê edebiyata klasîk û ola Hindê
8. Darê ku kesên hikumdar, mirovên dînî wekî sembola hêzê bi kar tînin
9. Notayek… Serokê rûhanî yê xaçparêzan

### JOR-JÊR

1. Cêr… Dijbera germ
2. Pisporê ekonomiyê
3. Vexwarina sereke… Hesinê ku li binê piyê hespan dixin
4. Rojek… Rêxistina polîsan a naziyan
5. Baneşana bêhntengiyê… Amadebûna hilanîna lengerê keştiyê
6. Cejn, eyd
7. Dinya, cîhan… Paytexta Perûyê
8. Mijar
9. Cihê herî kûr ê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê… Yezdanekî misrî

# KJK: Xwedîderketina li çand û ziman erkekî niştimanî ye



Komîteya Perwerdeyê ya KJK’ê diyar kir ku siyaseta qirkirin û pişaftina çandî kûrtir dibe û got, divê jin, dayîk û civaka me tev li hemberî vê êrişa qirker raweste. Li ziman û çanda xwe xwedî derkeve. ***R-2***


Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 985 | 7-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/


# ‘NIKARE LI TERMÊN XWE JÎ XWEDÎ DERKEVE’





Endama Konseya Fermandariya YJA Star diyar kir ku artêşa tirkî derbên pir giran dixwe û got, dewleta dagîrker ji bo ku jimara leşkerên xwe yên mirî veşêre hincetên beredayî peyda dike. Di destê gerîlayan de termên leşkeran hene lê dewleta tirkî li van terman jî xwedî dernakeve. ***R-5***

## `Sucên dewleta tirkî yên li dijî jinan ji bo tolstandina ji şkandina DAIŞ’ê ye’

Fikret Ebdullah bal kişand ser armanca êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û got, tişta ku dewleta tirkî ya dagîrker dike, dewama kiryarên ku DAIŞ’ê nikarî bike ye, bi teybetî sûcên li dijî jinan. Lewra jin ji wan re bûne kelem. ***R-2***

## Xwendekarên Mekatronîk di projeya xwe ya derketinê de alavên elektronîk çêkirin

Xwendekarên Mekatronîk ya Peymangeha Bilind ya Zanistên Teknîkî ya Zanîngeha Rojava projeyên xwe yên derketinê pêşkêş kirin. Di vê çarçoveyê de robot û alavên elektronîk çêkirine da di paşrojê de sûd ji wan were girtin. ***R-3***



## Çalakiyên li hemberî dewleta dagîrker li tevayiya qadan dewam dikin

Yekîneya Tolhildanê ya Şehîd Bedran li dijî qereqoleke artêşa tirkî ya li Sîrê ya Başûr çalakiyek li dar xist û 2 dagîrker hatin cezakirin. Herwiha li Îzmîrê Milîsên Atakan Mahîr yên HBDH’ê li natorvanên faşîzma AKP û MHP’ê dan. ***R-3***



## Edhem Barzanî: Bila azadiya fikir û raman li Herêma Kurdistanê were qedexekirin!

Siyasetmedarê Kurd Edhem Barzanî xwest yasayên pêwîst yên ji bo azadî, demokrasî û raman werin qedexekirin û got, lewra xelk ji ber wan yasayan tên girtin. ***R-4***

## Piştî fermanê wêje

Piştî lêkolîna me ya di vî warî de me dît ku bi Kurmancî birrek berhem li ser Şingalê hatine nivîsîn. Li başûrê Kurdistanê jî bi Soranî çend berhemên hêja hene ku bi mijara Şingalê daketine. Lê bi qasî ku me lê kola, bi Kirmanckî di vî warî de berhem derneketine. ***R-7***




## Bîlgîç: Modela Srîlanka bi sedê salan e li Kurdistanê pêk tê

Ekolojîst Mûrat Bîlgîç diyar kir ku rejima dewleta Tirkan ji roja ava bûyî ve ji bo tinekirina Kurdan êrîşî xwezaya Kurdistanê dike û got, ji ber wê ‘Modela Srîlanka bi sedê salan e li ser Kurdan pêktê. ***R-6***



### 2 Hêzên Kurdan: Gerîla û Şervan

Faruk Sakik ***R-4***

### Fermana 74’an ya Şingalê

Ahmed Aktaş ***R-5***

### Ti kes nikare me bi hev bide kuştin

Dijwar Ehmed Axa ***R-6***

# KJK: Xwedîderketina li çand û ziman erkekî niştimanî ye

**Komîteya Perwerdeyê ya KJK'ê diyar kir ku siyaseta qirkirin û pişaftina çandî kûrtir dibe û got, divê jin, dayîk û civaka me tev li hemberî vê êrîşa qirker raweste. Li ziman û çanda xwe xwedî derkeve.**

**Navenda nûçeyan**

KJK`ê bang li her kesî kir ku heta mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî were bidestxistin û astengî rabin divê li ziman û çanda xwe xwedî derkevin.

Derbarê siyaseta inkarker û qirker ya li ser xwendekar, sazî, kedkar û mamosteyên Kurdî yên li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê,Komîteya Perwerdeyê ya KJK'ê daxuyaniyek da.

KJK'ê di despêka daxuyaniya xwe de diyar kir ku li Tirkiye û bakurê Kurdistanê tevayiya hewldanên mamoste û kedkarên Kurdî, li hişmendiya qirker ya hukûmeta AKP-MHP'ê diqelibin û wiha got: "Di vê sezona havînê de ku li hemû welatan tevahî perwerdekar ji bo sala perwerdê ya 2022-2023'yê li ser rê û rêbazên perwerdeyeke zanistî û pêşketî gotûbêj dikin, amadekarî dikin; mixabin li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê hemû hewldanên mamoste û kedkarên Kurdî, li hişmendiya asîmîlasyonîst, qirker a hukûmeta AKP-MHP'ê diqelibin."

**'Ziman nîşana çand, hebûn û nasnameya însan e'**

KJK'ê da xuyakirin ku i Tirkiye û Bakurê Kurdistanê mamoste û xwendekarên Kurd yên bi xeyal û hêviyek mezin di beşên Kurdî de xwendin, niha amade ne zarokên Kurd bi zimanê Kurdî perwerde bikin û wiha got: "Ji bo civaka me nifşek zana û pêşketî ava bikin, divê tu caran neyê jibîrkirin ku, însan bi zimanê xwe jiyan dike, bi peyvên xwe diponije. Ji ber ziman, nîşana çand, hebûn û nasnameya însan e."

KJK'ê da zanîn ku li Tirkiye, li gorî dane û agahiyên van rojên dawiyê hatine eşkerekirin, îsal 20.000 xwendekaran bi awayek fermî ji bo perwerdeya zimanê Kurdî serlêdan kirine û wiha got: "Ji bo perwerdeya van xwendekaran pêwîst e Wezareta Perwerdê ya Tirkiyeyê herî kêm 200 mamosteyan erkdar bike. Lê belê niha ji nav sedan mamosteyên Kurdî, tenê 3 kadro destnîşan kirine. Di vê mijarê de rewşeke nakok û trajîk heye."

**'Siyaseta bişaftina çandî bi dijwarî dewam dike '**

KJK'ê da xuyakirin ku 26'ê Çileya 2011'ê Lijneya Fêrkirina Bilind ya Tirkiyê (YOK) bi xwe Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî erê kiribû û wiha got: "Di hinek zanîngehên Bakurê Kurdistanê de beşên Kurdolojiyê hatibûn vekirin û ji van fakulteyan her sal bi sedan berendamên mamostehiya zimanê Kurdî derdiçin, lê heta niha ji nav van sedan berendamên mamostehiyê tenê 82 mamoste hatine erkdarkirin, yên din di rewşeke bêhêvî û bêçare de tên hiştin.

Dîsa sazî û komalayên perwerdehiyê yên îsal, meha Sibatê ji bo 'Roja Zimanê Dayîkê ya Navnetewî' der barê girîngiya zimanê dayikê de çalakî kirine, ji aliyê Dadgeha Makeqanûnê ve ceza li wan kedkar û mamosteyên Kurdî hatiye birîn. Ev nêzîkatiya dewleta Tirk eşkere nîşan dide ku, siyaseta qirkirin û bişaftina çandî ya li ser gelê me û saziyên demokratîk bi dijwarî didome, heta roj bi roj tê kûrkirin."

**'Divê rê ji bo azadiya çandî û fikrî vebe'**

KJK'ê bal kişand ser nêzîkatiyên Wezareta Perwerdê û Dadgeha Makeqanûnê ya dewleta tirkî û wiha got: "Em wek Komîteya Perwerdê ya KJK'ê, bi navê tevahî jinên têkoşerên azadiyê van nêzîkatiyên Wezareta Perwerdê û Dadgeha Makeqanûnê ya dewleta tirkî wek qirkirina çandî ya li ser jin û dayîk û gelê xwe pênase dikin, lewre bi tundî şermezar dikin. Her wisa em bang dikin ku, di çarçoveya Mafê Sê Nifşan de nêzîkî hemû saziyên civakî, çandî yên li Tirkiyeyê bibe, rê li azadiya çandî û fikrî veke."

**'Divê gelê me li ziman û çanda xwe xwedî derke ve'**



Komîteya Perwerdeyiyê ya KJK'ê diyar kir ku siyaseta onkarker û qirker ya li ser xwendekar, sazî, kedkar û mamosteyên Kurdî tê sepandin, heman demê êrîşeke li ser tevahî hebûn û nirxên civaka Kurd e û daxuyanî wiha hat qedandin: "Di serî de jin, dayîk, pêwîst e tevahî civaka me li hemberî vê êrîşa asîmîlasyonîst û qirker bêdeng nemîne. Bi zanebûna 'cezakirina her sazî û mamosteyek Kurd, cezakirina tevahî civakê ye', li tevahî mamoste, kedkar û saziyên xwe xweyî derkeve, ji bo mafê perwerdeya zimanê dayikê li Tirkiyê bê misogerkirin û dawî li hemû astengiyan bînin, wekî erkeke nîştimanî bênavber çalakiyên demokratîk xurt bikin, bi israr û biryardarî li ziman û çanda xwe xwedî derkevin."

# `Sucên dewleta tirkî yên li dijî jinan ji bo tolstandina ji şkandina DAIŞ'ê ye'

**Ferîda Omer-Şehba**

**Fikret Ebdullah bal kişand ser armanca êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û got, tişta ku dewleta tirkî ya dagîrker dike, dewama kiryarên ku DAIŞ'ê nikarî bike ye, bi teybetî sûcên li dijî jinan. Lewra jin ji wan re bûne kelem.**

Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo têkbirina destkeftiyên şoreşa Rojava yên bi îradeya gelên herêmê û têkoşîna jinan bi dest ketîn, her tim di nava hewldanê de ye. Sûcên dewleta tirkî ya dagîrker li bakur û rojhilatê Sûriyê rojbiroj zêdetir dibin, bi taybetî li dijî jinên pêşeng. Lewra dixweze bi êrişên xwe yên li dijî jinê vîna gelan bişkîne. Lê têkoşîn û serkeftina van jinên şoreşger ya li dîjî DAIŞ'ê nîşanî cîhanê tevê da ku ji bo parastina civaka xwe dikarin her tiştî bikin û îradeya wan ti caran naşke.
Herî dawî di êrişa dewleta tirkî ya dagîrker ya 22'ê Tîrmehê de li ser riya Qamişlo yek ji pêşengên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û (QSD) Jiyan Tolhildan şehîd bû û fermandara giştî ya hêzên YAT'ê Roj Xabûr û Endama YAT'ê Barîn Botan, ku li Qamişlo beşdarî Konferansa 10an ya salvegera şoreşa Rojava bûbûn. Piştî derketina ji konferansê rastî êrişa balafira dewleta tirkî ya dagîrker hatin.



Derbarê mijarê de endama Komîteya Jinan ya Meclisa Kantona Efrînê Xatûn El-Sultan û Endama Komîteya Jinan ya Meclisa Kantona Efrînê Fîkret Ebdulla ji me re axivîn.
Xatûn El-Sultan di destpêka axaftina xwe de sûcên dagîrkeriya dewleta tirkî yên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi taybetî sûcên li dijî jinên pêşeng şermezar kirin. Herwiha şehîd Roj, Barîn, Jiyan û jinên têkoşer yên di riya azadiyê de bîr anîn.

**`Dewleta tirkî ya dagîrker stûnên şoreşê dike amanc`**

Xatûn diyar kir ku, deskeftiyên şoreşê bi berxwedan û têkoşîna jinan pêk hatiye û wiha domand: "Jin stûna û bingehî ya şoreşa Rojava ye. Li dijî çeteyên DAIŞ'ê jinan bi lehengî şer kirin û riya azadiyê ronî kirin. Herwiha jinên têkoşina azadiyê riya rizgariya ji koletiyê nişanê tevayiya jinan dikin. Ji ber wê dewleta tirkî ya dagîrker pêşeng û rêveberên jin dike amanc."

**`Emê bêdeng nemînin`**

Xatûn El-Sultan wiha domand: "Emê li hemberî van êrişan bêdeng nemînin. Divê em tev li hemberî dagîrkeriya dewleta tirkî ku bi her awayî hewl dide me tine bike û îradeya me bişkîne, têkoşîn û berxwedana xwe xurt bikin.``

**`Dewleta tirkî tola DAIŞ`ê hiltîne`**

Endama Komîteya Jinan ya Meclisa Kantona Efrînê Fîkret Ebdullah jî wiha got: "Tişta ku dewleta tirkî ya dagîrker dike, dewama kiryarên DAIŞ'ê ye, bi teybetî sûcên li dijî jinan. Lewra jin ji wan re bûne kelem."
Herwiha Fikret şehidên YPJ'ê bîr anîn û got, hevrê Jiyan, Barîn û Roj, mînakên jinên azad û berxwedêr bûn. Lewra ji bo doza gelê xwe û ji bo azadiya jinan dixebitîn. Êrişa dewleta tirkî ya dagîrker ya ser van hevalan têkçûna wê ya di alî de diyar dike."



**`Bêdengiya hêsên navneteweyî rê li ber sûcan vedike`**

Fikret axaftina xwe wiha qedand: "Em bêdengiya hêzên navneteweyî ya li hemberî kiryarên dagîrkeriya tirkî yên li ser herêmên me şermezar dikin. Divê civaka navneteweyî û dewletên qaşo ji bo ewleyiya herêmê li vir in, divê berpirsyariya xwe bi cih bînin. Lewra bêdengiya li hemberî van sûcan hevparî û dilrihetiya wan diyar dike."

Hêjayî bîrxistinê ya ku ev ne cara yekê ye dewleta tirkî ya dagîrker jinên pêşeng yên bakur û rojhilatê Sûriyê, dike amanc. 23'yê Hezîrana 2020'an dewleta tirkî ya faşîst bi belefirên keşfê êriş li Helincê êriş kir û di encamê de 3 rêveberên Kongreya Star şehîd bûn. Herwiha bi heman şêwazê 25'ê Çileya 2021'ê rêveberên Tevgera Ciwanên Kobanê yên jin bûn amanc û 19 Tebaxa 2021'ê jî li Til Temir fermandar Sawsan Bîrhat kirin amanc. Li hemberî van êrişan ku şucên şer in, hêzên navneteweyî bêdeng mane û bêdengiya wan bi hevkariya berçav hatiye pênasekirin.



# Piştî fermanê wêje

**Piştî lêkolîna me ya di vî warî de me dît ku bi Kurmancî birrek berhem li ser Şingalê hatine nivîsîn. Li başûrê Kurdistanê jî bi Soranî çend berhemên hêja hene ku bi mijara Şingalê daketine. Lê bi qasî ku me lê kola, bi Kirmanckî di vî warî de berhem derneketine.**

Fermana Şingalê ya 2014'an bi gelek hêlên xwe tesîrek çêkir li ser xelkê. Nexasim dîmenên êrişên DAIŞ'ê yên hovane hîna jî li ber çavên gelek kesan in. Êş û azara civaka Êzîdî li Şengalê kişand, his û hestên gelek insanan fûrandin û wan xwest vê fermanê bi awayekî bînin ziman. Ji lewma, piştî fermanê di warê helbest, film û romanê de afirîneriyek derket holê û hin kesan hestên xwe yên derbarê fermanê de anîn ziman û xwestin vê birîna hezarê salan ya nekewiyayî bi rêya huner derman bikin yan jî qet nebe aş bikin. Di vê nivîsê de em ê berê xwe bidin wêjeya Kurdî û lê binihêrin ka bi Kurdî li ser Şengalê û fermanê, piştî fermana 3´yê Tebaxê çi berhem hatine afirandin.

Piştî lêkolîna me ya di vî warî de me dît ku bi Kurmancî birrek berhem li ser Şengalê hatine nivîsandin. Li Başûrê Kurdistanê jî bi şêwezarê Soranî çend berhemên hêja hene yên ku bi mijara Şengalê daketine. Lê bi qasî ku me lê kola, bi şêwezarê Kirmanckî di vî warî de berhem derneketine holê. Heger hebin jî ew bi ber çavên me neketin û me ew nedîtin.

**'Selwa' serpêhatiya keçeke Êzîdî**

Romana "Selwa: Birîna Daxdayî Şingal" ya nivîskar Medenî Ferho ye. Ferho ku ew bi xwe jî Êzidiye, bi vê romana xwe daye pey serpêhatiya keçeke Êzidî ku di encama êrîşên DAIŞ'ê de hatiye revandin. Selwa keçeke "Êzdî" ye û ji "Şingalê" ye, ji aliyê çeteyên DAIŞ´ê ve hatiye revandin, ligel keçên din yên Êzîdî ji destê çeteyên DAIŞ´ê kariye bireve. Hin ji wan keçan, di dema hewldana xwe de hatine kuştin, hinek ji wan jî xwe gihandine "Şingalê". Selwa keça Kurd, yek ji wan keçan e ku xwe gihandiye "Şingalê". Pirtûk sala 2017'an ji Weşanên Do derçûye.

**Romana 'Şingal' ê**

Luqman Silêman nivîskarekî ji Qamişloyê ye û li Elmanya dimîne. Romana wî ya bi navê "Şengal" sala 2018'an ji Weşanxaneya J&J derçû. Roman bi Kurmancî ye û ji 317 rûpelan pêk tê. Luqman Silêman êrişên qirêj yên DAIŞ'ê di nava romana xwe de hûnaye. Dilnas Berazî ku pêşgotina romanê nivîsiye dibêje, "Ev berhem hemahema hemû taybetmendiyên ku di nava civaka Kurdên Êzîdî de hene, ji alîyê civakî, çandî, evînî, dîrokî û olî ve, bi rengekî pir zelal aşkere dike. Her wiha ev berhem, hemû taybetmendiyên hêza DAIŞ'ê hov ku pişta xwe didane ola Îslamê û nijada Ereban a dagirker li ser axa Kurdistanê bi şêweyekî dirokî û zanistî li ser zar û zimanê walî û emîrên wan e ku bi kiryarên kuştin û talana Êzîdîyan radibûn, hemûyan vedibêje."

**Vejîna çilmêran û parastina Çiyayê Şingalê**

Romana bi navê "Şengal, vejîna çilmêran" ya nivîskar Azad Ararat jî sala 2018'an ji Weşanxaneya Aryenê derçûye. Wî di vê romana xwe de behsa çil mêrên ku Çiyayê Şengalê diparêzin kiriye. Şêx Adî ji Lalişê çil mêran dişîne Çiyayê Şêngalê da ku Şerfedînê biparêzin. Yê ku ji van çil mêran re serkêşiyê dike Brahîm e. Her çil mêr tên ba Şerfedîn. Ji wan re tê gotin, Behdîn ango Xwebexş. Ew çil mêr, Şerfedîn û Çiyayê Şengalê diparêzin. Ji deverên Çiyayê Şengalê jî mêr dihatin Çilmêran. Li Çilmêran şêx û pîr li hev diciviyan. Ji wê demê pê ve li ser serê girê Çilmêran qube tim hebûye. Di qubeyê de serderî (micêwir) disekinin. Ew xwedî li qubê derdikevin û çirayê pê dixin. Li vir hêja ye mirov bibêje ku Azad Ararat esas Kirmanc e, lê terîch nekiriye ku romanê bi Kirmanckî binivîse.

**Jinên winda yên Êzîdî**

Nivîskar Yildiz Çakar jî di romana xwe ya "Ev rê naçe bihuştê" sala 2019'an ji Weşanxaneya Lîsê derxist. Roman behsa jinên winda yên Êzîdî dike. Kurteyek ji danasîna vê romanê wiha ye; "Ev rê naçe bihuştê, neçîrokeke windabûnê ye ku ji pênûsa Yildiz Çakarê darijîyê ser kaxiz û bûye vegotineke romanî û hatiye li ber me xwe telandîye. Ev Rê Naçe Bihuştê, romana jinên winda, jinên kurdên êzdî ye ku tiştên hatî serê wan wek qewam her roj bi ber guhê me dikevin. Ew ji me re dibêje; 'Ger hebe hestekî we yî heyînîyê divê hûn nikaribin rakevin li pêşberî vê neyînîyê…' "

**'Ma tiştek bi Şingalê hatiye?'**

´Ma tiştek bi Şebgalê hatiye´ navê pirtûka kurteçîrokên Ronî Stêrk e. Pirtûk sala 2020'an ji Weşanxaneya Lîsê derketiye. Her wekî ji navê wê jî dîyar e, çîrokên êş û karesata ku bi êrîşa xedar a DAIŞ'ê ya di sala 2014'an de pêk hat, dibêje. Her çîrokek, ji awirê ruhekî ve, ji awirê dilekî ve, ji awirê jinekê, ji awirê mêrekî, ji awirê dîtinekê, ji awirê bîrûbawerîyekê ve tê gotin. Û bi her çîrokê re em êşên dîtir dibînin. Piştî şikandina DAIŞ´ê li Baxozê, ji zarokên Êzîdî yên hatin rizgarkirin, yekî ji rojnamevanan dipirsî "Ma tiştek bi Şengalê hatiye?" Çîroka li ser meselê navê xwe li kitêbê kiriye.

**'Şîna Şengalê'**

Îhsan Colemêrgî bi pirtûka xwe ya bi navê "Şîna Şengalê" dîroka ol û gelên li herêmê bi kurtayî tîne bîra me û piştî wê jî behsa "Êzdîtî" û "Êzdîyan" dike. Nivîskar ji bilî dîroka olan û gelan behsa serdema avakirin, dagirkirin û belavbûna DAIŞ'ê jî dike. Di mijarên dagirkirin û belavbûna DAIŞ'ê de hûn ê hûrgilîyên kuştin, revandin, ferzkirina terikandina dînê xwe û firotina jinan bibînin. Nivîskar di vegotina dagirkirina gund, bajarok û navçeyên Şengalê, qirkirin û jinrevandinan de bi pirranî ji serî heta dawiyê behsa serpêhatîyên jineke ku hatiye revandin û gelek caran hatiye firotin dike. Ev pirtûk jî sala 2021'ê ji hêla Weşanxaneya Lîsê hatiye çapkirin û zimanê wê Kurmancî ye.




**'Xemeke giran e Şingal'**

Rojhat Xemgîn ku ev 24 sal in di hepsê de ye, bi pirtûka xwe ya pêşîn "Xemek giran e Şengal" a ku sala 2015'an ji Weşanxaneya Sîtavê derçûye dilê xwe li helbestê rehet dike. Rojhat Xemgîn demeke dirêj e ku bi Kurmancî dinivîse û wî bi vê pirtûka xwe xemxuriya xwe ya derbarê Şengalê de bi riya helbestan aniye ziman.

**Soranî li ser Şingalê**

Ji bo em hîn bibin bê ka li Başûrê Kurdistanê bi şêwezarê Soranî çi pirtûk li ser Şengalê û fermana Êzidiyan derçûne, me xwe gihand wergêr Rêbîn Mihemed. Rêbîn Mihemed çend pirtûkên ku bi şêwazarê Soranî li Başûrê Kurdistanê çap bûne wiha rêz kir; romana "Tutî" ya Neberd Fuwad sala 2015'an, romana Aram Heme ya bi navê "Pelatînkên Tarîtiyê" sala 2017'an, romana "Şengal, hay li minê" ya Kerîm Kake sala 2019'an, romana "Laleyên Lalişê" ya Kameran Xoşnaw sala 2019'an, romana "Koço, fermana reş" ya Hesen Îbrahîm sala 2019'an, romana "Maziyarê Şengalî" ya Nebez Goran sala 2019'an û pirtûka helbastan ya bi navê "Tawisên Laleşê" ya Fereydûn Saman a sala 2021'ê derçûne.




***Ozgûr Polîtîka***

# Bîlgîç: Modela Srîlanka bi sedê salan e li Kurdistanê pêk tê

**Ekolojîst Mûrat Bîlgîç diyar kir ku rejima dewleta Tirkan ji roja ava bûyî ve ji bo tinekirina Kurdan êrîşî xwezaya Kurdistanê dike û got, ji ber wê 'Modela Srîlanka bi sedê salan e li ser Kurdan pêk tê.**

Xwezaya Kurdistanê ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve tê talankirin. Şewitandina daristanan, talankirina xwezayê weke parçeyek ji êrîşên li ser gelê Kurd têne nirxandin.
Ekolojîst Mûrat Bîlgîç li ser sedem û armanca dewleta Tirk a ji êrîşên li ser xwezaya Kurdsitanê axivî.

Bîlgîç diyar kir ku talankirin û wêrankirina xwezaya Kurdistanê bi giranî weke rewşeke demkî tê nirxandin û destnîşan kir ku ev nirxandin şaş e. Bîlgîç anî ziman ku êrişên li ser bejahiya cografya Kurdan xwedî rabirdûyeke dîrokî ye û ev yek ji dema avabûna Komara Tirkiyeyê û vir ve dewam dike.

**ji bo tinekirina Kurdan, xwezaya Kurdistanê tê talankirin**

Ekolojîst Bîlgîç bi bîr xist ku li Tirkiyeyê bi avabûna rejîma komarê re li dijî hemû aîdiyetên etnîkî yên ji bilî Tirkan polîtîkaya tunekirinê hate meşandin û got, "Ji bilî Tirkan, her kes ya weke kole yan jî civakên divê bêne tunekirin, pênase kirin. Serhildanên Şêx Seîd, Seyîd Riza, Agirî û Koçgirî bi hovîtiyeke mezin tepisandin, lê belê zanîbûn ku 'serketineke mayinde' bi dest nexistine. Lewma jî biryar dan ku xweza bi kêrî Kurdan tê û di vê der barê de rapor amade kirin. Di van raporan de hevoka herî balkêş wiha bû: 'Xweza wan diparêze'. Xwezaya Kurdistanê jî xwezayeke welê ye ku mirovên li navê, bêyî ku piştgiriyê ji derve werbigire dikarin bi salan bijîn. Lewma di raporan de tunekirin û talankirina xwezaya Kurdan weke karekî sereke hate destnîşankirin."
Bîlgîç bi bîr xist ku polîtîkaya êrîşê ya dewleta Tirk a li ser cografya û xwezaya Kurdistanê carna di asteke giran de, carna jî bi rengekî rûtîn hate meşandin û wiha dewam kir, "Demekê gund şewitandin, vala kirin. Li gundên şewitandî zerar dan ekolojiyê. Her wiha bi ragihandina herêmên qedexekirî bi dehan salan hin herêm li ketin û derketinê asteng kirin. Tevî van hemûyan dar û nebat talan kirin. Ji ber ku şewitandin û valakirina gundan ji bo wan nebû bû çareserî. Ji ber ku dema hebûna xwezayê dewam dikir, gava şert û mercên guncaw diafirîn lê vedigeriyan. Lewma jî xwestin ku xwezayê bi temamî talan bikin û pirsgirêkê ji kokê ve çareser bikin."

**'Modela Srîlanka bi sedê salan e li Kurdistanê pêk tê'**

Bîlgîç destnîşan kir ku li Kurdistanê şewitandina daristanan û birîna daran piştî sala 2009'an zêde bûn û got, "Sala 2009'an li Srî Lankayê propagandaya wê yekê hate kirin ku li dijî Pilingên Tamîlê 'serketineke mayinde' bi dest xistine. Navê 'Modela Srî Lankayê' li vê kirin. Ev model sala 2012'an pêşkêşî Serokkomarê Tirk jî hate kirin. Li dijî Kurdan ji bo çikandina golê, ji bo kuştina masiyan, dewleta Tirk li ser vê modelê hate îqnakirin. Bi dîtina min vê pêşkêşiyê zêde bala rayedarên Tirk neşikand. Ji ber ku bi sedan sal in ev model li



dijî Kurdan tê bikaranîn. Lê belê modela Srî Lankayê bi vî rengî li qada navneteweyî rewa bû. Lewma li dijî civakên ku ji bo maf û azadiyê têdikoşin, ev model bi hêsanî hate bikaranîn. Bi vî rengî bendav û çêkirina qereqolan zêde bû, daristan hatin şewitandin, dar hatin birîn û bi rêbazên cuda xweza hate talankirin."

**'Dema ku mijar Kurdistan be, komeleyên ekolojiyê bêdeng dimînin'**

Bîlgîç işaret bi helwesta saziyên 'hawirdorparêz' jî kir û anî ziman ku saziyên bi vî rengî yên ku ji bilî cografya Kurdistanê hesasiyeta wan li ser ekolojiyê hene, dema mijar dibe Kurd li gorî dewleta Tirk tevdigerin. Bîlgîç got, "Dema ku rayedarên dewleta Tirk îdîa dikin ku sedema talankirina xwezaya li Kurdistanê 'fikarên ewlekariyê' ne, komeleyên ekolojiyê yên li Tirkiyeyê jî mixabin ji vê îdîayê bawer dikin. Halbûkî, gelo jiyana Kurdan çi yê dewleta Tirk aciz dike ku bi îdîaya ewlekariyê xwezayê talan dike, diviyabû li vê yekê bipirsiyan. Mînak Greenpeace li ser talankirina ekolojiya li Kurdistanê got, 'ne qada wê ya pisporiyê ye', lewma bêdeng ma. Li cihekî ku dar têne birîn pêwîstî bi pisporbûnê nîne. Ev nêzîkatî ne cihê baweriyê ye. Greenpeace bi xwe tevlî karên vemirandina şewata li daristanên Tirkiyeyê bûbû. Lê belê dema ku mijar dibe Kurdistan em dibînin ku ji dewleta Tirk cudatir nafikirin."
***ANF***

# Hena El-Daxil bi pîşeyê dirûtinê debara malbata xwe dike

**Hena El-Daxil debara xwe ya aborî, bi pîşeyê dirûtinê ku bi taybetî li deverên gundewar gelek kes tercîh dikin û pêdiviya wan pê heye e dike.**

Hena El-Daxil a 30 salî, ji bajarê Hecîn ê Dêrezorê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye, ji ber şert û mercên dijwar ên aborî, bi pîşeya dirûtinê debara malbata xwe dike.


Hena El-Daxil anî ziman ku ew beriya 20 salan ji dayika xwe fêrî pîşeya dirûtinê bûye û wiha got: "Terzîtî pîşeyekî kevneşopî ye. Destpêkê makîne tune bûn dê û dapîrên me derzî û ta bi kar dianîn, paşê jî makîneyên destan çêbûn.

Niha em li ser makîneyên pîşesazî yên pêşketî dixebitin ku karê me hêsantir bûye. Jin ji bilî dirûtinê dikarin karên xwe yên li malê jî bikin. Ji ber buhabûna makîneyan û ji ber krîza aborî ya li herêmê ji bo jinan peydakirina wan zehmet e. Her wiha bihayê malzemeyên ku ji bo dirûtinê hewce ne jî zêde dibe. Tevî van kêşeyan, ez pabendî pîşeya xwe me, piraniya dema xwe bi dirûtinê derbas dikim û jinên ciwan ên ku dixwazin fêrî vê pîşeyê bibin jî perwerde dikim. Jin cilên durûtî ji kincên hazir zêdetir tercîh dikin ji ber ku li gor tercîha wan tê û ji ber buhabûna cilên hazir. Divê her jin hewl bide bigihîje xewn û xeyalên xwe, jin xwedî îradeyeke xurt in."



Yek ji jinên ciwan ên ku Hena El-Daxil wan fêrî pîşeya dirûtinê dike Ebîr El-Eswed diyar kir ku bi fêrbûna vê pîşeyê, wê dikaribû hemû pêdiviyên xwe yên taybet bi cih bîne û wiha got: "Beriya 12 salan ez fêrî pîşeya dirûtinê bûm û min jê hez kir. Piştî hînbûnê ez li cem rahênera xwe Hena El-Daxil berdewam dikim û li malê jî makîneyeke min a destan heye."
***JINHA***

## Tîr



### Ti kes nikare me bi hev bide kuştin

**Dijwar Ehmed Axa**

Di dîroka me Kurdan de, çi ya kevin, çi ya nû, ji ber ku me pêşengiya berxwedana gelan li dijî zordaran kiriye, dijminên me pir bûne. Ji pêşengiya Medan (B.Z. 612) heta şoreşa 19 Tîrmehê ya rojavayê Kurdistanê, me li ber xwe daye, qehremanî û lehengî nîşanî alemê kiriye.
Ji ber wê dijminên me pir bûne û welatê me parçe perçe kirine. Di şerê Ebexê (Çaldiran) de Osmanî û Sefewiyan kirin du parçe. Pişt re Ingilîz û Fransiyan li Lozanê 1923`yan kirin çar parçe. Lê vê parçekirinê kela dilê dijminan honik nekir. Ji ber wê rêbazeke din bi karanîn. Em berdan hev, em kirin dijminên hev, şerê xwebixwe derxistin û Kurd bi destê Kurdan dan kuştin.
Dîsa kela dilê wan honik nebû. Vê carê rabûn Kurd kirin sed parçe, ji hev belawela kirin û li dijî hev bi kar anîn. Zaza, Kurmanc, Soran, Kelhor, Goran, her yek Zaraveyek û her Zarave çend beş in û hev qebûl nakin. Ev tenê ji mile Ziman ve. Ji mile Eşîran ve kirin hezar parçe û ji hev xistin. Bê hêz kirin. Mehmûdkî û Etmankî, tevî Axayên xwe gişt pismamên hev bûn, lê tev kirin dijminên hev. Hesenan û Heyderan berdan hev, her du Kurd bûn lê Hesenan Sinî bûn û Heyderan Elewî bûn. Êlên Kurdan yên mezin, piçûk kirin (Şikak, Caf, Lor, Bextyar, Omeryan, Baban, Milan…).
Lê niha rewş hatiye guhertin, Kurd êdî bûne yek, li hev xwedî derdikevin, bi kurdewarî kar dikin. Dema min li dîroka me Kurdan guhdar dikir meseleyek hat bîra min. Dixwazim bi we re parve bikim.
Dibêjin li welatekî mişk miselit bûbûn. Zad û zeviyên wan tev talan kirin, rezên wan hemû xwarin. Ne arvan û ne ard bi wan ve hiştin. Hakimê wî welatî pir aciz bû. Bang li şêwirmendên xwe kir û got delêliyan berdin nava bajêr; kesê van mişkan biqelîne, çi bixwaze ezê bidimê. Welhasil wilo kirin; sofiyek tê cem hakim. Dibêje, hakimê min ez dikarim van mişkan biqelînim. Hakim dibêje tuyê çawa wan biqelînî? Sofî dibêje hakimê min, ez ti pereyan ji te naxwazim, tenê qefeseke hesin ya mezin ji min re çêke û bila gundi 1000 mişkî bi saxî bînin. Hakim wisa dike. Sofî hezar mişkên xwe bi saxî dixe qefesê û derî li wan digire. Rojek, dido, sisê mişk birçî dibin, dest bi xwarina hev dikin. Pêşî yên piçûk, yên pîr û nexweş tên xwarin. Hin bi hin mişk kêm dibin.
Carna sofî hinek xwarinê diavêje ber wan. Mişk li hew hiltînin. Lê dema sofî mişkekî li derve dikuje, diavêje nava wan, bi carekê xwe diavêjinê û dixwin. Sofî dibîne ku mişk elimîne xwarina goştê hev. Devê qefesê vedike. Ji 1000 mişkî li derdora 50,60 mişkî mane. Lê bûne weke pisîkan. Bi carekê dikevin nava bajêr. Mişkên heyîn ji wan narevin, dibêjin ew jî mişk in, nizanin ku rengê wan tenê yê mişkane, lê di cewherê xwe de bûne pisîk. Bi wî awayî mişkan tevan dikujin û mişk diqelin.
Îcar dema em bên ser dîroka me Kurdan, emê bibînin ku di dema Emewî, Ebasî, Selçûqî û Osmanyan de, her tim ev dek û dolab li Kurdan kirine, em elimandine xwarina hev. Lê weke min di serî de gotî acizbûna Tirkan ew e ku nema karin me bi hev bidin kuştin, em nema goştê hev dixwin.



# Çalakiyên li hemberî dewleta dagîrker li tevayiya qadan dewam dikin

**Yekîneya Tolhildanê ya Şehîd Bedran li dijî qereqoleke artêşa tirkî ya li Sîrê ya Başûr çalakiyek li dar xist û 2 dagîrker hatin cezakirin. Herwiha li Îzmîrê Milîsên Atakan Mahîr yên HBDH'ê li notirvanên faşîzma AKP û MHP'ê dan.**

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Çalakiyên li hemberî tevgera dagîrker ya dewleta tirkî ya mêtinger, bênavber dewam dikin. Di encama van çalakiyan de dewleta tirkî li tevayiya qadan derbeyên giran dixwe û tengav dibe.

Yekîneya Tolhildanê ya Şehîd Bedran Gundikremo di 3'yê Tebaxê saet di 15.30'an de li qereqola dewleta Tirkî ya dagîrker ya li Sîrê ya Başûrê Kurdistanê da. Ev qereqol baregeha dewleta tirkî û navendeke MÎT'ê ye.

Di çalakiyê de li çeperekê hate xistin û 2 leşkerên Tirk yên dagîrker yên di çeperê de hatine kuştin.

Yekîneya Tolhildanê ya Şehîd Bedran Gundikremo li ser çalakiyê wiha ragihand: "Dewleta tirkî ya dagîrker û xayînên ku xizmeta wan dikin divê bizanin ku li her bihosta



Kurdistanê dê bibin hedefa me. Wê axa Kurdistanê ya pîroz ji dagirkeran re bibe goristan."

**Milîsên HBDH'ê li Îzmîrê li notirvanan da**

Herwiha li Îzmîrê Milîsên Atakan Mahîr ên HBDH'ê li notirvanên faşîzma AKP û MHP'ê dan.

Milîsên Atakan Mahîr yên HBDH'ê bi daxuyaniyekê diyar kirin ku wan li Îzmîrê li notirvanan dane û wiha gotin: "Me li Menemena Îzmîrê li notirvanan da. Milîsên Atakan Mahîr ên HBDH'ê di 4'ê Tebaxê de bi şev li Taxa Asirlikê li notirvanên bi peyatî di dewriyeyê de bûn da.

Ji ber lêdana çekdarî ya milîsên me notirvan ketin nav panîkê. Notirvanek kete erdê û yên din jî reviyan. Wesayîtên polîsan û ambûlans hatin qadê û milîsên me piştî çalakiyê bi selametî ji qadê derketin."

# Xwendekarên Mekatronîk di projeya xwe ya derketinê de alavên elektronîk çêkirin

**Xwendekarên Mekatronîk ya Peymangeha Bilind ya Zanistên Teknîkî ya Zanîngeha Rojava projeyên xwe yên derketinê pêşkêş kirin. Di vê çarçoveyê de robot û alavên elektronîk çêkirine da di paşrojê de sûd ji wan were girtin.**

Vekirina Zanîngeha Rojava Tebaxa 2016'an, yek ji serkeftinên Şoreşa 19'ê Tîrmehê ye. Li gel destkeftiyên tenduristî û xizmetgûzarî yên bi armanca avakirina nifşekî pêşketî û zana, zanîngeh xwe dispêre derfetên xweser û pisporiyên xwecihî û sûdê ji tecrûbe û têkiliyên navneteweyî digire û pêş dixe. Beşa Mekatronîk ya Peymangeha Bilind ya Zanistên Teknîkî ya li zanîngehê ku 2019`an hat vekirin, yek ji beşên nû yên zanîngehê ye ku xwe dispêre pêşxistin û avakirina pisporiyên teknîkî yên xwendekaran da ku di qadên elektronîk de sûdê jê bigirin.

Mekatronîkqadeke endezyarî ya berfireh e ku endzyariya mekanîk û ya kehrebeyê, endezyariya kompûterê, herwiha endezyariya elektronîk pêk tê û xwe dispêre teoriya tehekumê. Ev beş ji civakê re girîng e ji ber ku cîhana elektronîk pêş ketiye.

Piştî 3 salan ji vekirina vê peymangehê, di van rojan de 44 xwendekarên beşa mekatronîk projeyên xwe yên derketinê yên çêkirina alavên elektronîk pêşkêş dikin ku dibe di siberojê de sûdê jê bigirin.

Sîstema xwendinê ya li vê peymangehê wek pergehên werzên xwendinê ye ku ji 6 werzan pêk tê û li ser 3 salan hatiye dabeşkirin. Derketiyên vê peymangehê karin di gelek waran de bixebitin, ji wan taqîgehên nû, kargehên nû, werşeyên teknîkî, sazkirin û sererastkirina alavên elektronîk ên pêşketî.

Endama rêveber ya Beşa



Peymangeha Bilind ya Zanistên Teknîkî û endezyar Sîham Mihemed diyar kir ku di salên xwendinê de di vê peymangehê de, digel beş nû bû û derfet jî kêm bûn, karîn zemîneke baş ava bikin ku di warê xwendinê û teknîkê de xwe bispêrînê. Li aliyekî din jî pisporan di salên xwendinê de wane dan xwendekaran ku behreyên wan xurt bibin. Lewend Yusif ku yek ji derketiyên vê peymangehê ye axivî û got wan li vê peymangehê xwendina xwe ya teorî û pratîkî bi dawî kirine û alavê ku piştî pêşxistinê di paşrojê de karin xwe bispêrinê, herwiha projeyên din jî ku di dema pêş de bixwînin, pêşkêş kirine.

**'Ambargoyê bandor li me kir'**

Lewend Yusif diyar kir ku ambargoya li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bandor li Zanîngeha Rojava kir, lewma di peydakirina madeyên çêkirina parçeyên elektronîk de zehmetiyan dikişîne û got: "Di heman demê de nikare xwe bigihîne zanîngehên navneteweyî, lê tevî vê serkeftina projeya xwe îsbat kir ku li ser asta Rojhilata Navîn



yekane model e."

Lewend Yusif destnîşan kir ku armanca wan ji çêkirina alavên elektronîk û pêşxistina wê di pêşerojê de ew e ku xizmeta mirovahiyê bikin û di kargehan de werin bikaranîn.

**'di roja me ya îro de mirov xwe dispêre teknîk û teknolojiyê'**

Ji xwendekarê ji Efrînê yê bi navê Omer Şahîn anî ziman ku piştî 3 salan ji xwendinê, projeya xwe ya derçûnê amade kir û wiha dewam kir: "Armanca sereke ji vê projeyê ew e ku civak sûdê jê werbigirin û xizmeta wan bike, nexasim di



halê hazir de ku xwe dispêre teknîk û teknolojiya."

Omer Şahîn destnîşan kir ku hewcedariya welat bi vê teknolojiya mezin heye û got: "Mînaka wê jî dema artêşa Tirk a dagirker bajarê Efrînê dagir kir, çekên pêşketî yên ku NATO`yê dane wan bi kar anîn. Lewma divê ev qad li Bakur û Rojhilatê Sûriyê were pêşxistin û xurttkirin nemaze ku ev beş alavan pêşkêş kirin ku hêjaye di pêşerojê de were pêşxistin û alavan çêdike ku di kargehan de bi karkeran re bibe alîkar."
***ANHA***

# Hemdan El-Ebid: Divê aloziya Sûriyê bi rêbazên siyasî ne leşkerî were çareserkirin

Cîgirê hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Hemdan El-Ebid diyar kir ku rêveberî ji diyalogên navxweyî re vekirî ye ku xaka Sûriyê parast û got, divê diyalokeke niştimanî pêk were da ku aloziya Sûriyê dûrî vebijêrka çekdarî çareser bike.

Ji ber serhişkiya hikumeta Şamê û girêdana wê bi vebijêrka leşkerî, di hema demê de ji ber destwerdana Tirkiyê ya li Sûriyê û dagirkirina beşek ji bakurê wê, aloziya Sûriyê her ku diçe kûrtir dibe.

Li ser vê mijarê, cîgirê hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hemdan El-Ebid ji ANHA'yê re axivî û got: "Ji destpêka aloziya Sûriyê û avakirina Rêveberiya Xweser a ku xeta durist pejirand ve û piştî têkbirina çeteyên DAIŞ'ê, Rêveberiya Xweser li ser erdê îsbat kir ku QSD'ê ya ji hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tê, şênî parast û terora cîhanî ya DAIŞ'ê têk bir."

### 'Rêveberiya Xweser yekîtiya xaka Sûriyê parast'

Hemdan El-Ebid diyar kir ku Rêveberiya Xweser yekitiya xaka Sûriyê parast û wiha domand: "Rêveberiyê şerê terorê kir, li gorî biryara 2254'an bi yekitiya xaka Sûriyê ve girêdayî ye. Em her tim dibêjin ku rêveberî li gorî rêgezên na ji şerê navxweyî re, na ji parçekirina Sûriyê re, na ji destwerdana derve re kar kir. Em bi hêvî ne ku diyalogên cidî bi rejîmê re werin kirin da ku aloziya Sûriyê bi awayî siyasî ne leşkerî were çareserkirin."

El-Ebid da zanîn ku opozîsyona ku desteka siyasî û leşkerî ji Tirkiyê digire, naxwaze aloziya Sûriyê were çareserkirin û got: "Lê ajnîdeyên derve yên dewleta Tirk dimeşîne û îdia dike ku ew ji bo berjewendiyên gelê Sûriyê kar dike, her wiha fermandarên komên çekdar ên ku desteka xwe ji Tirkiyê digirin, îdia dikin ew ku parastina ewlehiya neteweyî ya Tirkiyê dikin, ne ku gelê Sûriyê dipaêrzin.''

### 'Em bi diyalogên Sûrî-Sûrî re ne'

Hemdan El-Ebid bi domdarî got: "Em banga parastina tevahî sînor dikin, xaka Sûriyê ya hemûyan e. Em banga destûreke sûrî dikin ku hemû tê de di erk û mafan de wekî hev bin. Agahiyên ku vê dawiyê belav bûne ku dibêjin di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê de hevdîtin çêbûne, ev ne rast in, hevdîtin çênebûne. Em bi hêvî ne ku hikumeta Sûriyê di çareserkirina aloziyê de cidî be û li ser maseya diyalogan bi Rêveberiya Xweser re rûnê."

El-Ebid îşaret pê kir ku vegera rewşa beriya 2011'an ne mumkin e ku şênî hatin koçberkirin, bajar hatin wêrankirin û destwerdana derve hate kirin û sûrî li tevahî cîhanê der bi der bûn. Her wiha got: "Çareseriya yekane ya aloziya Sûriyê projeya Rêveberiya Xweser e."

Hemdan El-Ebid got, projeya Rêveberiya Xweser ne cûdexwaz e û wiha axaftina xwe dewam kir: "Me yekitiya xaka Sûriyê parast, em banga serdestiya dewleta Sûriyê li gorî destûra nû ya lihevkirî dikin ku mafên hemû sûriyan bêyî cudabû misoger bike. Sûriyê mûzaîkeke bedew e, ne piranî, ne kêmnetew, ne jî radîkal û ne jî îslam wê birêve bibe, lê divê qanûneke sivîl li gorî destûrekê ku hemû li ser wê li hev bikin, were birêvebirin."

El-Ebid bal kişand ser lihevkirinên ji sala 2019'an ve ya piştî dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî û got: "Lihevkirineke di navbera Tirkiyê û DYA'yê de li ser agirbestê heye, lê Tirkiyê pabendî vê lihevkirinê nabe û gefên dagirkirina herêmên din ên Sûriyê dixwe."

El-Ebid da zanîn ku artêşa Sûriyê li eniyên şer ên bi artêşa Tirk a dagirker re hene, divê dewleta Sûriyê sînorê xwe biparêze û got: "Em di Rêveberiya Xweser û QSD'ê



de bi hêvî ne ku hêzên leşkerî li hev bikin, em beşek ji Sûriyê ne, divê em sînor û gelê xwe bipaêrzin."

### 'Hêzên radîkal û islamî şerê QSD'ê dikin'

Hemdan El-Ebid di berdewama axaftina xwe de got: "Bi hêvî dikin ku diyalogên siyasî hebin ku hemû aliyên sûrî bigire nav xwe. Lê hikumeta Şamê bi israr e ku tevahî xaka Sûriyê vegerîne bin kontrola xwe bêyî ku Rêveberiya Xweser bibîne. Şam hîna li gorî qanûna 107 wekî rêveberiya xwecehî nêz dibe."

Cîgirê hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hemdan El-Ebid di dawiyê de got: "Em dixwazin bi artêşa Sûriyê û hikumeta Sûriyê re sînorê Sûriyê biparêzin, piştî li ser masaya diyaloga siyasî rûnên, ev mijarekî navxweyî ye divê em sûrî bi xwe çareser bikin, em destwerdanên derve û muxalefeta ku îdiaya parastina sûriyan dikin, naxwazin."

***ANHA***

# Edhem Barzanî: Bila azadiya fikir û raman li Herêma Kurdistanê were qedexekirin!

**Siyasetmedarê Kurd Edhem Barzanî xwest yasayên pêwîst yên ji bo azadî, demokrasî û raman werin qedexekirin û got, lewra xelk ji ber wan yasayan tên girtin.**

Li Herêma Kurdistanê her ku diçe azadiya fikir û raman pirtir tê sînordarkirin, rojnamevan li ser karên xwe tên girtin, çalakvan li ser çalakiyên xwe û welatî jî ji ber daxwaziyên xwe tên girtin.

Siyasetmedarê Kurd Edhem Barzanî bicihneanîna yasayên di parlamentoyê de yên ji bo azadî, fikir, raman û rojnamevanan hatine pejirandin, rexne kir.

Siyasetmedarê Kurd Edhem Barzanî yasayên di parlamentoyê de hatin pejirandin û nayên bicihanîn rexne kir û got; "Divê parlamento projeyasayên ji bo demokrasî, azadî, rojnamevanî, azadiya fikir û raman, azadiya xwêşandanê bixe dengdanê û qedexe bike. Dema ev pêkhat, wê civaka Kurdistanê dev ji rojnamevanî, azadiya fikir û raman û xwepêşandanan berde. Ji ber ku ger xelk dev ji van berde wê êdî neyên girtin, revandin, telefonên wan wê ji wan neyên standin û dawiyê de jî nexin girtîgehê. Ji ber ku wê êdî bizanin, ev karane li welatê ku sedan hezar şehîd dane, qedexe ye."

Hêjayî gotinê ye siyasetmedar Edhem Barzanî yê ku berî demekê serdana Îranê kir û



xwest di 8'ê Tîrmeha 2022'an de vegere Herêma Kurdistanê ji aliyê hêzên PDK'ê ve hate astengkirin û rê nehat dayîn ku Barzanî derbasî Hewlêrê bibe.

***ROJNEWS***

## 2 Hêzên Kurdan: Gerîla û Şervan



Farûk SAKIK

Di civîna sêalî ya Îran, Rûsya û Tirkiyê ya li Tehranê de ku krîza Sûriyê mijara sereke ya civînê bû, Rûsya û Îranê ji bo êrîşa ser rojavayê Kurdistanê lembeya kesk ji Tirkiyê re pê nexistin.

Serokkomarê Îranê teqezî li ser piştgiriya Îranê ya hikûmeta Sûriyê kir û got, riya aramî û ewleyiyê li sînorên li gel Sûriyê û welatên cîran, amadebûna bihêz ya artêşa wî welatî ye li sînoran û hebûna hevkariya wê hêzê ye li gel welatên derdorê.

Piştî vê civînê 5ê Tebaxê Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan û Serokê Rûsya Vladimir Putin li bajarê Soçî yê Rûsya civiyan.

Berî civînê li Kremlînê daxwiyaniyek hat dayîn û hat gotin, em hesasiyeta Tirkiyê ya derbarê bakûrê Sûrî de fêhm dikin. Berî civînê Erdogan û Pûtîn her duyan jî bal kişand ser herêma di binê dagîrkeriya dewleta tirkî de.

Her kes ji hev vê pirsê dike: Dibe ku piştî civîna Soçî dewleta tirkî dest bi êrişan bike.

Baş e Rûsya destûr da ku 30 km ket erdê Sûrî, lê wê di km 31'ê de jî tehdîd ji bo sînorê Tirkiyê tinebe. Rûsya û her kes vê derewa Tirkiyê baş dizanin.

Di pişt perdeyan de çawa li hev kirine em nizanin. Lê em baweriyê bi du hêzên Kurdan tînin. Bawerî bi xwe û parastina erdê xwe tînin.

Yek: Gerîla..Me lehengî û çelengiya gerîla ev du sal in test kiriye. Em dinêrin artêşa Tirkan hê jî neketiye Hewlêrê û ji wir derbasî Kerkûk û Misûlê nebûye.

Yn jî weke wan digot; 'Di demeke kurt de wê ji Qendîlê derbasî "Sîncarê" Şingalê bibin.' Lê hê jî li qadên Parastina Medya birînên xwe yên ji gerîla xwarîn dipêçin-derman dikin. Birîndar in. Îsal em bûn şahid NATO jî nikare wan ji gerîla biparêze. Ji gerîla ditirsin cesaret nakin êriş bikin.

Du: Şervan… Hêzeke din jî li bakur-rojhilatê Sûriyê heye. Lehengî û qehremaniya van şervanan rojbiroj li qada cîhanê belav dibe. Van şervanan çeteyên DAIŞ'ê ji hole rakiribûn.

Piştî ku dewleta Tirkan heremên weke Efrîn û Serê Kaniyê dagîr kirin, ev ji bo şervanan bû sedem ku xwe jinûve dîzayn bikin. Ji bo parastina Rêveberiya Xweser amadekariyeke mezin dikin. Di vê navê de rojbiroj jimara wan jî zêde dibe. Ne ciwanên Kurd tenê ciwanên gelên din jî, di nava vê artêşê de cih digirin.

Ew dizanin û bawer dikin ku dewleta Tirkan firsetê bibîne wê êriş bike. Ji bo wê destê wan li ser tetikê û li benda wê rojê ne. Eger dewleta Tirkan heta niha êriş nekiribe sedemek jî hebûn û amadekariya van şervanan e. Dizanin li wir ka çi amadekarî heye û ku bê balafir herin wê darbên giran ji şervanên azadiyê bixwin.

Hin alî dagîrkirina hin herêman hincet nîşan didin û fikarên xwe tînin ziman. Hin rojnamevan û nivîskar jî weke wan difikirin û dibêjin wê dewleta Tirkan êriş bike. Ev kes, bila amadekariya nû ya şervanan bidin aliyekî, bila rizgakirina Kobanê û têkbirina DAIŞê bînin ber çavên xwe bes e. Wê demê wê baweriyê bi lehengiya şervanan bînin û fikarên xwe berteref bikin.

Encam: Divê em nebêjin dijmineke hov e ji Soçî destûr girt wê were wiha wiha bike. Divê em ji hovitiya dijmin zêdetir, bi lehengiya gerîla û şervanên xwe bawer bikin.



# 'Nikare xwedî li cenazê xwe jî dernakeve'

Endama Konseya Fermandariya YJA Starê Hêzil Ozgur diyar kir artêşa tirkî derbên pir mezin dixwe û got, dewleta dagîrker ji bo ku jimara leşkerên xwe yên mirî veşêre dibêje; 'Di latê de ketiye, ketiye avê, piyê wî şemitî, mozê pê ve da' û hincetên beredayî peyda dike. Di destê gerîlayan de termên leşkeran hene lê dewleta tirkî li van terman jî xwedî dernakeve.

**Navenda nûçeyan**

Konseya Fermandariya YJA Starê Hêzil Ozgur diyar kir hêzên YJA Starê ji bo bidestxistina azadiyê û jiyana watedar berxwedaneke xurt û şerekî mezin dikin û got, Gerila bi dewlemendiya taktikên xwe darbên mezin li artêşa  tirk dide.

Endama Konseya Fermandariya YJA Starê Hêzil Ozgur di derbarê êrişên dewleta tirk ya dagîrker yên li ser gerila û li dijî van êrişan tekoşina dirokîya gerila ji ANF'ê re axivî.

### 'Gerîlayên nûjen tola sedsal ji dewleta tirk radike'

Ozgur diyar kir têkoşîna ku 40 sal in didome gelê Kurd ji bo xwe nas bike û rêxistin bike, geşedanên mezin pêk aniye û got "Fîşeka pêşîn a ku li Êlih û Şemzînanê hatiye avêtin, îro ji Behra Reş heta Şaho, ji Dêrsimê heta Avaşînê, ji Amedê heta Zapê deng vedide. Bi domandina vê re asta têkoşînê jî zêde dibe. Gerîlatiya modern û profesyonel a ku li ser mîrateya 15'ê Tebaxê hatiye avakirin, îro li



çiya û deştên Kurdistanê ji aliyekî ve li hemberî artêşa Tirk a dagirker tola sedsalan distîne û ji aliyê din ve jî ber bi serfiraziyê ve dimeşe û mîsogeriya azadiyê di têkoşîna xwe de şênber dike."

### 'Ev çek li hemberî DAÎŞ'ê nehatin bikaranîn'

Ozgur diyar kir konsepta tunekirinê ya li hemberî Rêberê Gelê Kurd, gelê Kurdistanê û hêzên parastinê li dinyayê tu mînakeke wê tune ye û got "Hemû hêzên NATO'yê teknîka şer û derfetên maddî dide dewleta Tirk. Bi hemû qirêjî û bêhiqûqtiya xwe şerekî dermirovahiyê dike. Di vî şerî de TC û hêzên xwefiroş di konsepta îmhayê de israr dikin û dixwazin encamekê bistînin. Hêzên navneteweyî li ser esasê berjewendiyên xwe tevdigerin û şirîkatiya van sûcan dikin. Ligel ku DAÎŞ ji bo hemû mirovayetiyê xetere bû, li hemberî DAÎŞ'ê jî çekên nukleer, kîmyewî û fosforê nehate bikaranîn. Li ser gerîlayên azadiyê yên ku li hemberî DAÎŞ'ê şer kiribûn, ev çek tên bikaranîn û her kes bêdeng e.

### Dijmin Derbên Giran Dixwe

Îro li qada şer dijmin ligel ku piştgiriyeke xurt werdigire jî hesap û planên xwe bi dest nexistiye û rastî berxwedana gerîlayan hatiye. Dijmin ketiye nav rewşeke giran û her ku gavekê diavêje bêtir têk diçe. Her roj dibêjin ew ê encamekê bistînin û PKK'ê biqedînin lê niha li cihê ku hatinê ne û di şer de derbên giran dixwin. Ji ber ku bi teknîka xwe nikarin encamekê bistînin bi çekên nukleer, termobarîk, çekên kîmyewî dixwazin encamekê



bistînin.

### Nikarin xwedî li cenazeyên xwe jî derkevin

Li Herêmên Parastinê yên Medyayê ji aliyê gerîlayan ve şerekî giran tê meşandin. Gerîla bi tarza tevgerê ya nû û modern li her derê û her demê çalakiyan dikin. TC dixwaze van derbên giran veşêre û ji bo ku hejmara leşkerên xwe yên mirî veşêre dibêje 'Ji kendal ketiye, ketiye avê, pêyê wî şemitî, mozê pê ve da' û hincetên beredayî dike. Di destê gerîlayan de cenazeyê leşkeran heye lê dewlet xwedî li van cenazeyan jî dernakeve. Gerîla bi dîmen îspat kiribû ku cenaze di destê wan de ye lê dewlet hê jî qebûl nake

### 'Dewleta tirkî ya dagirker têk çûye'

Hêzil Ozgur da diyarkirin ku dewleta tir bi hemûhevildanên xwe re têk çûye û got, Leşkerên Tirk ên ku nikarin ji nêz ve şer bikin, çekên fosforê yên qedexe bi kar tînin. Leşkerên Tirk cesareta wan tuneye ku têkevin tunelên şer û kûçikên ku perwerde kirine û kontrayan bi darê zorê diajon tunelan. Gerîla Tv dîmenê vî tiştî par ve kir. Ev jî diyar dike ku TC têk çûye. Hevalên me li hemberî teknîka pêşketî ya sedsala 21'emîn li ber xwe didin û bi baweriya ji bo jiyana azad, îradeya ruhê Apoyî şer dikin.

### YJA Star di asta pêşeng de rola xwe bi cih tîne

Di vî şerî de hêzên me yên YJA Starê xeta fedaî ya Zîlanê û berxwedana Bêrîtanê di helwesta xwe de şênber kirine û di şer de rola xwe ya pêşeng bi cih tînin. Heta niha bi dehan çalakiyan li hemberî konsepta îmhakirinê ya dijmin bûn asteng. Hêzên YJA Starê bi tîmên bi tevger û li tunelên berxwedanê bi îrade û rengê xwe berxwedanên xurt kiriye. Bi çalakiyên gerîla yên wekî sûîkast, sabotaj, vedizî, kemîn, derblêdan û gelek taktîkên din derb li leşkerên Hûlûsî Akar tên xistin.

### Şerê ku niha YJA Star dike wê ji bo tekoşina jinên cîhanê bibe çavkaniyek dîrokî

Şerê ku hêzên YJA Starê dikin ji bo têkoşîna berxwedanên hemû jinên dinyayê wê bibe çavkaniya moral û tecrubeyek mezin derxistiye holê. Berxwedaneke xurt tê kirin. Ruhê êrîşê yê heval Mizgîn Ronahî, ruhê fedaî yê heval Avzem, tarza heval Viyan a ku li ber dijmin bû asteng, cesaret û fedakariya heval Şervîn, armanca serkeftinê ya heval Şaristan û bi çalakiyên xwe yên ruhê Apoyî mohra xwe li dîroka têkoşînê dane. Çalakiyên YJA Starê yên li ser xeta van hevalên me geş dibe, careke din nîşan dide ku dijmin bi ser neketiye. Şer bi giranî didome. Em hêzên HPG û YJA Starê jî em ê li ser xeta fedaî li ber xwe bidin, serkeftinê bi dest bixin, bi Rêbertiya xwe li Kurdistana azad alaya berxwedanê ya ku şehîdan ji me re mîrat hiştine, em ê vê têkoşînê bi serfiraziyê tacîdar bikin."

## Fermana 74'an ya Şingalê



Ahmet AKTAŞ

Ev fermana ku 3'yê Tebaxa 2014'an, bi taybetî li Şingalê, belê bi giştî li ser civaka me yê Êzîdî tevê pêk hat, di encama planeke berfireh de hatibû amadekirin. Di kesayeta Êzîdiyan de, li dijî doz û tevgera gelê Kurdistanê bû. Jixwe dîroka fermanên li ser Êzîdiyan, heta 74an, kêmzêde tê zanîn û naveroka armanca tevan yek e, ew jî; qirkirina gelê Kurd e! Berî vê fermanê bi 2 heyvan (1ê Hezîranê), li Emman ya Urdunê civînek çêdibe û biryara vê fermanê tê dayîn. Ev civîn, bi serkêşiya nûnerên hêzên navdewletî, nûnerên Urdun, Tirkiyê, Iraq û PDK'ê pêk tê. Hema li pey vê civînê, DAIŞ amade kirîn. 10'ê Hezîranê di ajon ser Mûsil û bêşek dikeve destê wan. Êdî projeya Emmanê, gavbigav dimeşe. Digel ku armanca sereke, êrîşa ser Şingalê û Şoreşa Rojava bû, ajotin ser Kerkûkê, Reqa û hwd. jî. Mirov dikare di çend xalên bingehîn de armanca vê Fermanê destnîşan bike: Yek: Di kesayeta ola Êzdayî û Êzîdiyan de, şkandina îradeya azad ya hemdem. Dudu: Birîna koka gelê Kurd û Kurdistanê ji dîrokê.

Sisê: Roxandina Şoreşa Rojava.

Çar: Pêşîgirtin û şkandina rola jinê, bi taybetî di Şoreşa Kurdistanê de, bi giştî jî di teayiya civaka cîhanî de. Divê mirov li vir, xala herî girîng rola jinê ya di pêşengiya şoreşê de û peşvebirina civakê de watedartir bibîne. Di vê fermanê de, ma kiryara herî sosret û hovane, ma ne êrîşên ser keç û jinên civaka me ya Êzîdi bûn? Bi hezaran revandin, ewqas kiryarên dijmirovî anîn serê wan û jixwe niha jî bi hezaran wenda ne! Li vir ew destnîşankirin û şîroveya Rêber APO (bi taybetî ji bo parastina Êzîdiyan) ya li ser rola bikêr û hêja ya jinê, hem di dîrokê, hem di roja îro de, li ser civakê çendîn girîng e tîne bîra mirovan. Mînaka herî berbiçav, ev rola jinê di Şoreşa Rojava de derket holê û hê jî dewam dike. Çawa tê destnîşankirin ku; "jiyana wekhev û azad ya civakê, li kû hatiye hilweşandin, divê li wir li dermanê çareseriya civakê bigerin" û hwd. Lewma van hêzên kevneperest bi giştî, bi zanebûn ev ferman amade kirin, da rêveberiya jinê di şoraşa gelê Kurdistanê de û di civaka giştî de bide rawestandin. Bi taybetî êrîşên xwe yên giran û qirker birin ser jinê û niha jî, di rojeva plana wan de, mijara bingehî ye. Lêbelê, ev mirazê wan di qirika wan de ma. Yên pêşengî kirin û nehiştin planên wan pêk werin 12  gerillayên Tevgera Azadiyê bûn. Serkêşê vê fermanê her çendî DAIŞ xuya dibû, lê planger û fermandarên wan yên rastî dewleta tirkî û PDK bûn. 12 hezar pêşmergeyên PDK'ê û ewqas jî çekdarên Iraqê, ji Şingalê reviyan û radestî DAIŞ'ê kirin (Konsolosê Tirka jî li gel wan). Belê wan gerîlayên canbexş, mîna siwarên Dewrêşê Evdî, xwe gihandin hawara gelê xwe yê Êzîdî û ji qirkirinê rizgar kirin. Divê êdî rawestan nebe, bi giştî li gelê Kurdistanê û dostên wan, heta ku ev îradaye Xweseriya Demokratîk ya Şingalê, bi saya şervan û şehîdên HPG, YJA-STAR, YPG,YPJ, YBŞ û YBJê hatî bidestxistin, ji aliyê saziya navneteweyî (YN) ve bi statûyeke fermî were pejirandin!